

Dersa zimanê esl „HSU“

1. Dersa zimanê esl (HSU) çi ye?

Dersa zimanê esl (HSU), ku wekî dersa zimanê dayikê jî tê zanîn, pêşniyareke belaş ya hînkirinê ye ji bo xwendekarên xwedan çîrokeke navneteweyî (ji welatê biyanî). Hemû xwendekarên, ku ji bilî almanî bi zimanekî din mezin bûne û dixwazin şarezayîya zimanê xwe kûrtir bikin û tekûz bikin, vê dersê dibin. Ji bo pêşdebirina şiyânên navçandî, kêrhatî û girîng e ku meriv bi zimanê malbatê bi axive û binivîsîne. HSU piştgirî dide vê.

2. Agahiyên bingehîn li ser HSU

- Li Leverkusen niha 13 zimanan wekî HSU têne pêşkêş kirin: Albanî, Erebi, Yewnanî, Îtalî, Kirwatî, Kurdî/Kurmancî, Polonî, Portekîzî, Rûsî, Sirbî, Spanî, Tirkî, Ûkraynî.
- HSU pêşniyareke belaş e ji aliyê eyaleta Nordrhein-Westfalen.
- Xwendekarên dibistana seretaî û dibistana navîn 1 yê xwedan çîrokeke navneteweyî (ji welatên biyanî) dikarin beşdarî vê dersê bibin.
- Bi gelemperî heftê heta 5 dersan têne dayin, ku di ber dersên asayî re di çend rojan de piştînavro pêk tên.
- Ne li her dibistanê û li her navçeyê her ziman tên pêşkêşkirin. Ji kerema xwe re ji bo cihên dersê binêre:
<https://www.leverkusen.de/bildung/kita-schule/herkunftssprachlicher-unterricht>
- Qeydkirin ji bo tevahiya sala dibistanê pêwîst e û xwebixwe tê dirêj kirin. Tevlêbûn li HSU mîna li dersên asayî mecbûrî ye.
- Di dawîya sala xwendinê de, xwendekar belgeya beşdarbûnê werdigirin. Destkeftiyên HSU li ser sertîfîkaya pola asayî têne tomar kirin.
- Di dawîya dibistana navîn 1 de xwendekar beşdarî ezmûna ziman dibin. Agahiyên bêtir li vir bibînin:
 - Erlass 13-16 Nr.2 Herkunftssprachlicher Unterricht (v.20.09.2021)
<https://bass.schul-welt.de/16253.htm>
 - <https://www.schulministerium.nrw/herkunftssprachlicher-unterricht>

3. Çima baş e ku meriv beşdarî HSU bibe?

- Pirzimanî xezîneyek e ku divê were parastin û pêşvebirin.
- Şiyânên navçandî bi xêra vê dersê tên pêşxistin.
- Zanist destnîşan kiriye ku fêrbûna zimanekî dergeh vedike bo fêrbûna zimanên din.

4. Kî dikare beşdarî HSU bibe?

- Xwendekarên xwedan malbateke navneteweyî (ji welatên biyanî) bi germî li dersa HSU têne vexwendin.
- Girîng e, ku zarok û ciwan ji ber motîvasyon xwe beşdar bibin.

5. Qeydkirina ji bo HSU

Qeydkirin bi rêya sekretaryaya dibistana, ku xwendekar diçe wê, pêk tê. Hûn dikarin Agahdarî ji sekreteryaya dibistanê wergirin. Forma qeydkirinê hûn dikarin li vir bibînin:
<https://www.leverkusen.de/bildung/kita-schule/dokumente-hsu/Anmeldung-HSU-alle-Jahrgaenge.pdf>